



# KURDISTAN

## ALAYA RENGÎN

Her welatekî alaya xwe heye. Alaya tu welatî wek alaya welatekî din nîne. Ala perûyekî (paçekî) rengîn e bi stûnekê ve tê hilawîstin. Li ser avahîyên fermî, nefermî û carna jî li ser banên malan jî dihêt hildan.

Hildan û daxistina alayê bi rêûresmên taybet dihêt kirin. Alaya her welatî sembola wî welatî ye. Her miletek şanazîyê bi alaya xwe dike. Xelk serbestî, serfirazî, serxwebûn û azadîya xwe di alayê de dibîne.

### Alaya Kurdistanê

Ala Kurdistanê ku îro bi awayekî fermî li Kurdistana başûr dihêt hildan ji sê rengan pêk tê: sor, sipî û kesk, di nîveka wê de jî rojeka bîst û yek tîrêjî heye.

**Sor:** Sembola xwîna gelê me ye ku ji bo azadîya xwe rijandiye û hê dirijîne.

**Sipî:** Vîyan û hezkirina gelê me ye ji bo aştîyê.

**Kesk:** Sembola sirûşt (xweza) û dewlemendîya welatê me ye.

**Roj:** Di mîtolojîya me de pîroz e. Ew hêvîya gelê me ye ku ji taristana sitembarîyê derbasî ronahîya azadî û serxwebûnê bibe.



## Alaya Kurdistanê di dîrokê de

Alaya Kurdistanê ku îro li seranserê Kurdistanê tê pejirandin cara pêşî ji aliyê Rêxistina Civakî ya Kurdan di sala 1920ê de li Îstenbolê hatiye çêkirin. Her ev ala di serhildana Agirîyê (1927) de li serê çiyayê Agirîyê hatiye hildan.

Her dîsa ev ala ya me di 1946an de bi hin guherînên biçûk bûye alaya Komara Kurdistanê li Mahabadê.

Di dema Şêx Mehmûdê Berzencî de jî kurdan alayeke din bi kar anîne (1922, rengê wê kesk di nîveka wê de girovereke sor û li ser giroverê hîveke sipî heye). Lê di dîroka me de alên din jî hebûne wek:



Alaya serhildana Koçgirîyê, 1920



Alaya hikûmeta Şêx Mehmûdê Berzencî li Silêmaniyê, 1922



Alaya Şoreşa Agirî, 1927



Alaya Komara Mehabadê, 1946



Alaya fermî ya Herêma Kurdistanê başûr û hemû Kurdistanê